

Lênihêrîna kesekê/î ku emeliyat bi anestefîka giştî an bi dermanê hedarkirinê derbas kiriye

Ji min hatiye xwestin ku ez merî an hevala/ê xwe bibim malê piştî ew dermanê hedarkirinê bibe an li wê/î rêbazekî di bin anestefîka giştî de were kirin.

Gelo divê ez li hêviya çî bim?

Dibe ku dermanê hedarkirinê an anestefîk hin nexweşan piştî dermankirinê hinekî tevlihev û bêserûber bike. Ya giringtir, ew dibe ku li ser fikirîn û pûnişîna wan bandor bike û bigihîje ku ew nikaribin bi zelaî jî bifikirin. Ev dibe ku heya 24 demjimêran bidome, yanî heya roja din. Ji kerema xwe ve di vê demê de li wan miqate bin.

Gelo kengî ez dikarim heval an meriya/ê xwe bibim malê?

Wê karmend li nexweşxaneyê tenê rê bidin ku ew biçin malê gava ku tenduristiya wan baş bibe û hûn li gel wan bin. Divê hûn ji 18 salî mezintir bin û divê hûn wan bi otomobîl an bi taksî bibin malê – yanî wê baştir be bê bikaranîna veguhastina giştî.

Wê karmend nikaribin demeke rast bidin we ji ber ku hin nexweş hene ku dema başbûna wan piştî hedarkirin an emeliyatê ji yê din dirêjtir e.

Gelo wê ji min re were gotin ka divê ez çî bikim?

Wê bijîşk rênîşanên nivîskî der kirin û nekirina nexweşan piştî rêbazê mayîna wan li nexweşxaneyê bidin û ka ew ê hewceya tu dermanên zêde bin an na.

Ji kerema xwe ve van rênîşanan bi merî an bi hevala/ê xwe re bixwînin û piştrast bin ku her xal tê şopandin.

Heger tu xemên we an yê wan li ser dermankirina wan piştî çûna malê hebe, hûn dikarin bi me re bi rêya telefonê têkevin têkiliyê.

Divê heval an meriya/ê min li malê çi bike?

Divê ew xwe vehesîn da ku ew bi ewlehî baş bibin.

Heger ew bêserûber bin û divê ew xwe bilivînin, divê ew bi alîkariya we bimeşin û heger gengaz be xwe ji dereceyan jî dûr bixin.

Pêdivî ye ku ew dermanên xwe yê rojane bibin heger ji hêla bijîşk/ê wan rawestandina birinê nehatibe gotin.

Divê ew çi nekin?

Dibe ku ew nikarin piştî anesteziyê an standina dermanê hedarkirinê heya 24 demjimêran bi zelaî bifikirin. Di vê demê de divê ew tiştên hanê nekin:

- bûyîna berpirsa/ê zarokan an lênihêrîna kesên din
- ajotina otomobîl an duçerxeyê
- xwarinçêkirin an bikaranîna tu amûr
- dayîna biryarên giring, tevî ku ew dibînin ku ew baş dihesin
- parvekirina çi tiştî li ser medyaya civakî
- vexwarina elkolê.

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîşkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpirsiyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta ji dest tê ten venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ka ji me re bêjin hûn bi çi difikirin

Em li pêşniyaran ji bo baştirkirina vê belavokê pêşwazî dikin.

Heger tu şiroveyên we hebin, ji kerema xwe ve wan ji me re bi rêya emailê bişînin:
patientinformation@rcoa.ac.uk

Koleja Qiralî ya Anestezîstan

Churchill House, 35 Qada ionêrê Sor, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Yekem 2018

Wê ev belavok ji roja weşanê ve di nav sê salan de were nixandîn.

© 2018 Royal College of Anaesthetists

Ne qedexa ye ku ev belavok ji bo hilberîna materyalên agahiyên nexweşan were kopîkirin. Ji kerema xwe ve ji vê çavkaniyê resen bigirin. Heger hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşanxaneyê de din de bikarbînin, divê piştrastkirineke lîcîh were dayîn û logo, marqe û wêne jî werin rakirin. Ji bo agahiyên zêde ji kerema xwe ve bi me re têkilî deynin.